



BAKI BEYNƏLXALQ  
MULTİKULTURALİZM MƏRKƏZİ

---

BAKU INTERNATIONAL MULTICULTURALISM CENTRE

**Serek rêdaktor:**

Kamal Abdûlla,  
*Sedrê Şêwira Hîmayedarên Navenda Navnetewîye  
Mûltikûltûralîzmê ya Bakûyê, Akadêmîk*

**Nûnertîya rêdaksîya:**

Îsa Hebîbbeylî (*akadêmîk*), Azad Memmedov (*profêssor*),  
Asîf Hacıyêv (*profêssor*), Oktay Semedov (*dosênt*),  
Têlman Kazimov (*dosênt*), Qîsmet Rustemov,  
Serraf Husêynov, Revan Hesenov.

**Bersîvdarê weşana zimanê kurdî:**

Ahmed Apîyêv

*Li rûyê pirtûkêye paşînda ji wêneyên peykelên biçûk yê ku, pey-  
keldarê Azerbaycanê Goruş Babayêv yê ku, bi bingeha bûyerên  
dastana "Kîtabî-Dede Gorgûd" xuluqandîye pêk hatîye.*

*Wênekêş: Ehmed Mûxtarov*

ISBN: 978-9952-28-254-2

© NMNB, 2015



Bi plana derbazkirina ewlekariyên ku, ji Serencama Prêzîdêntê Rêspûblika Azerbaycanê, ya derbarê derbazkirina salvegera 200 salîya wergera zimanê almanî û weşandina ewlîn dastana “Kîtabî-Dede Gorgûd”, pêşta tê ji aliyê Navenda Mûltîkûltûralîzmêye Navnetewî ya Bakûyê 26 zimanada tê radestkirinê.

Azerbaycan	Ereb	Xinaliq	Lezgî	Tirk
Alman	Fars	Macar	Ûdî	Yûnan
Avar	Fransî	Îngîlîs	Rûs	Ûkrayna
Çîn	Gurcî	Îtalyan	Taliş	Yapon
Ermenî	Hînd	<b>Kurd</b>	Tat	Yehûdî*

\* Dahatîyêda ew yek têra tê dîtîne wekî ev pirtûk bi zimanên îspan, portûgal, îndonêzîya, holland, polyak, çêx, bolgar û bi zimanên din bê weşandirê.



**Serencama Prêzîdêntê Rêspûblîka Azerbaycanê  
derbarê derbazkirina 200 salîya cara  
yekemîn bi almanî werger û weşandina  
“Kîtabî-Dede Gorgûd”**

Sala 2015-a, karpêka “Dede Gorgûd”, ya ku tê şêwandinê çawa hêjaya netewîye gelê Azerbaycanê, ya ji xezina bîrdarîya vî gelî ji aliyê rohilatzan-ulumdarê alman Frîdrîx Fon Dîts derketibû holê, hatibû weşandin û ulmê du-nuyayêra dabû naskirinê, 200 sal xitim dibe.

Di nava wî wedeyê derbazbûyîda dastana “Dede Gorgûd”-ra girêdayî gellek lêkolîn hatine kirinê û gorgûdzanî çawa beşeke serhevda hatîû lema jî ber bi wê gavên ferz hatine avîtinê. Sala 2000-îda sersalîya 1300 salîya “Kîtabî-Dede Gorgûd”-ê bi xêza YÛNÊSKO di pîvandina navnetewîda bi heyte-hol hate derbazkirinê, ev jî di lêkolîna dîroka bîrdarîyêda bû pêgaveke nûh.

Bona parastina rakendîya netewîye çandê û bona nava ruhê nîsla nûhda azerbaycanî pêşta bê, wê yekêda pîrr bûna weyneka dastana “Dede Gorgûd”-ê hildine ser hesêb û bona meremê bêxofkirina gorgûdzanîyê deqa 109, niqitka 32-a ya Konstîtûsîya Rêspûblîka Azerbaycanê destbilind digirim birîyar dikim:

1. Pêşniyarên wezîrîya Çandê û Tûrîzmê ya Rêspûblîka Azerbaycanê, Wezîrîya Xwendinê ya Rêspûblîka Azerbaycanê bi tevî Akadêmîya Ulmaye Netewî ya Azerbay-

canê, Navenda Múltîkûltûralîzma Navnetewîye Bakûyê, Fonda Zanîneye ya rex Prêzîdêntê Rêspûblîka Azerbaycanê û ya Yektîya Nivîskarên Azerbaycanê hildine ser nêrîna, wekî cara yekemîn “Kîtabî-Dede Gorgûd” ji aliyê ulumdarê alman Frîdrîx Fon Dîtsda hatîye wergerandin, weşandin û naskirina wêya di nava ulmê dunyayêda, mîy-aserbûya bona programa çalekîyên 200 salîya wê bê rastandin radestî Kabînetê Wezîrîya Rêspûblîka Azerbaycanê bikin.

2. Kabînetê Wezîrîya Rêspûblîka Azerbaycanê pirsên ku, ji vê serencamê pêşta tê çareserke.

**Îlham Elîyêv**  
Prêzîdêntê Rêspûblîka Azerbaycanê

Bajarê Bakû, 20 sibatê, sala 2015-a.



**Hênrix Frîdrîx Fon Dîts**

**(1751-1817)**



## **Bi hub-hizkirina Fon Dîts...**

Sala 1815 rohilatzan û dîplomatê almane navdar Haynrîx Frîdrîx Fon Dîts beşeke dastana Azerbaycanê (Oxûz) "Kîtabî-Dede Gorgûd" werdigerîne zimanê almanî. Wedê Fon Dîts çawa baylozê yekemîn yê Prûssîyayê li dewletê Osmanliyê kar dikir destnîvîsarên cuda-cudaye Rohilatê berav dikir, ev destnîvîsar bala wîye taybetî dikişand ser xwe. Li vira mêrxas, bûyerên nitirandî mîfên yûnan dianî bîra wî, mînahevbûn, paralêltî, wekehevtî pîrr bûn. Bi vê menê jî ew, bona wergera ku, bide weşandinê ji beşên "Dede Gorgûd"ê "Beşa Basat Çavenî di-kuje" dijbêre wekehevbûna Basat û Odîssêy, Çavenî û Polîfêm, paralêltîya xêzên bûyera mecalê dide Fon Dîts, wekî dundana wêjeyî ya dastana "Dede Gorgûd" bibe derxe sedsalîyên hên.+

Û Fon Dîts wergera xwe bi pêşgotina ku, ser şirovekirineke himberî hevokirinêva kûr efrandibû li Bêrlînê dide weşandin. Bi vê yekêva, sala 1815 di ulmê dunyayê radestkirina dastana "Kîtabî-Dede Gorgûd" ser xwe digire. Pey wêra ulmdarên îtalyan, rûs, tirk, fransî, alman, amêrîkan, azerbaycanî ji Fon Dîtsê êstafêtê distînin dunya Gorgûdzanîya fire û bi wete, dewlemend û reng bi reng diefrînin. Bi vî awayî ji wê demê 200 sal derbaz dibe.

20-ê meha sibatê sala 2015 Prêzîdêntê Azerbaycanê Îlham Elîyêv girêdayî 200 salîya salvegera vê qewmandina nebîrkirîra serencameke gellekî ferz navand. Ev serencam ji aliyê dûhatîyên Dede Gorgûd hêjeya sîyasî ya rêzgirtin û şêkirdarîyê bona ruhê endamekî herî bi nav-deng yê çiqila romantîzmê filologîyayê alman yê sedsalîya XIX Fon Dîts bû. Bi vî awayî, sala 2015 ne ku tenê bona Azerbaycanê, lê bona hemû dunya filologîya û gorgûdzanîyêra bû çejn. Ev pirtûkêda ya ku, radeştî xwendevanan dibe pêşnîvîsara ya ku, Fon Dîts sala 1815 nîvîsîbû û ji 12 beşên pirtûka “Dede Gorgûd” beşek-beşa “Basat Çavenî dikuje” ya ku, Fon Dîts bijartibû cî-war bûye. Ne niherî wê yekê, wekî ji weşandina ewlîn, ya Bêrlînê 200 sal derbaz dibe hêjaya bilind ku, zanîyarê alman beqî dastana “Dede Gorgûd” dide potênsîala menevî ya gelê Azerbaycanê îro jî aktûale. Û em îro him şa dibin, him jî bi firnaxin ku, beşeke Dastana meye nemir ya ku, dikebe sîstêma hêjayên mirovayî û pêşgotina hêja ya Fon Dîts bi zîmanên dunyayêye rêvebir ronayî dibîne.

Bawerim ku, pirtûka ku, Navenda Mûltîkûltûralîzmê Navnetewîye Bakû amade kirîye ji çîjan netewî, ola dibe, bila bibe dilê hemû xwendewananda xiroşa ku, 200 sal berê dilê Fon Dîtsda rakiribû wê rake.

Bi hub û bi şêkirdarîya mezin ber bi hemû gorgûdzanîyaran û ber bi ruhê Haynrix Frîdrîx Fon Dîts,

**Kamal Abdûlla.**



# HÊNRÎX FRÎDRÎX FON DÎTS

*Sîklopa Oxûzê ya ku nûva  
eşkerekirî himberî ya Homêrê*

---

*Kîtabî-Dede Gorgûd.  
Beşa ku Basat Çavenî dikuje dide  
kivşê*





**SÎKLOPA OXÛZÊ YA KU,  
HIMBERÎ SÎKLOPA  
HOMÊR NÛH HATÎYE  
EŞKERE KIRINÊ**

Ji alîyê prêlatê û şewirdarê  
mîssiyayêyî xewle  
Hênrix Frîdrîx Fon Dîts

Hallê û Bêrlîn, 1815.

Li komîssiya pirtûkxana  
mala sêwîyên Hallê.



## ÇAVENÎ, YANÊ JÎ SÎKLOPA OXÛZ

### Ji zimanê Tatar-Tirk

1. Ji Destnîvîsara ku, min ev sernîvîsar hildaye li rûyê rûpêlê yekemîn awa hatibû nîvîsarê:

کتاب دره قورقود علی لسان طایفه اوغوزان

Bi zimanê gelê Oxûz-ev “Kîtabî-Dede Gorgûd”-e. Ev beşa kurt di defterxana min da di nava hemû destnîvîsarên mine Şerqê da bi jimara xweva ya 61-ye. Xût ew destnîvîsara pirtûkxana Kralê-Drêzdêndaye, awa bi şaşîyên heyîva jî, mîna ya li bal mine (*Bîranînên derbarê Paûlûsêda Beşa IV, rûpêl 13 №86*).

2. Ew sernîvîsar him weteya pirtûk nade der, him jî torîvanekî wê hatîye kivşê, ew jî bona xwendevanan dijwarîyê pêşta tîne, lema jî pêwîste xwendevanê vê destnîvîsarêva daha ji nêzîk bidine nas kirinê.

3. Destpêbûnêda (destnîvîsarêda) Kurt awa tê gotinê:

Dema nêzîkî wedê Resûl Elêyhusselam (Bona ruhê Mehemmed salavat) ji malbetekê mêrekî bi navê Gorgûd Ata (*Ata-Dede, yanê herdu jî bavone*), derket yê ku, hemû keseyetên (şecara) Oxûzayê yekemîn rind nas dikir. Ewî çî bigota dibû, ji dahatî yê bûyerên cuda-cuda qal dikir Heqq-Teala ruhdarî dida dilê wî.

Gorgûd Ata awa digot: Paşdemîya we dîsa hukumdarîyê derbazî Gayabe û evê yekê tu kesê nîkarbe ji destê wî bistîne. Ewê hetanî axirzemîn bidome. Li vir hukumdarîya dundanîya Osmanîyê têra tê ditînê.

Ewî nêtên vî tewrîye din jî gellek qal kirîye: Gorgûd Ata hemû pirsên Oxûzêye dijwar çareser dikir. Ewî çî bixwesta diqewimî. Bê şêwira Gorgûd Ata tişteke nedikirin.

Ewî çî bigota, gişk wîra qayîl dibûn. Bi gilîyên wî radibûn, rûdiniştin.

4. Bi şanîyê dundarîya Osmanîyêra eyane ku, ev pêşnîvîsar îdî wedê silsileta Osmanîyê hatibû damirazandinê, hatibû nîvîsarê.

Lê çawa dikarî xuluqandina Dede Gorgûd berî silsileta Osmanîyê-wedê Mehemmedra bidî girêdanê: min pirtûka "Oxûznameyêda heqîq dabû kivşê ku, ew nikarîbû berî sedsalîya 9-a bijîya. Lê ezê ne ku, daha gellekî ji weteya wê biaxivim, daha gellekî ji dijberîyên wêye heyî qalkim.

5. Wedê têtî ser destpêbûna wê, ew gotinên Dede Gorgûde bi şîretin. Ya yekemîn awaye: Gazî Xwedê nekî, karê te cî bi cî nabe. Ewana (gotinên bi şîret) di destnîvîsara minda weke rûpêl nîvekî cî digire. Awa, tê kivşê ku, hemû şîret nîbin jî piranî çawa di "Oxûznameyêdaye", ji alîyê kesekî sisîyada di wirda çawa heye hatîye zêde kirinê.

6. Pirtûk bi zimanê Dede Gorgûdê destpê dibe, paşê ji alîyê kesekî dudada tê domandinê.

Dede Gorgûd qal kiribû-binê xanê min cî gotibû:

Devê xwe vekim xwedayê sermeyî mezin bi-pesînim û yê din.

7. Ew (Dede Gorgûd) ji pesinandina xwedê derbazî pesinandina Mehemmed û Elî dibe. Hemû pirtûkên Mehemmedîyêda (Muselmanada) edet ahaye, tenê torîvanên ne ji mezheba şîeyan xelîfe Elî bîr naynîn,

derbazî duakirina malbeta Mehemmed û hemnêtên wî dibin. Ji vir ew hafî der tê ku, pêşnîyazkirî, yanê jî beravkar ne heneffî, ne jî Osmanî bûye. Lê ji Dede Gorgûdê axaftinê, çawa min pirtûka “Oxûzname” daye kivşê, wê daha rastbe, wekî em bêjin ew şîeye.

8. Pey vê pesinandinêra rûpêlê 2-da derbarê qenderên jinanda bi bersîvdarî Ozanek qal dike, bi sernivîsareke taybetîva hinek rêzim dide û hetanî rûpêlê 3-ya dide domandinê.

9. Wê şûnda 12 ser hatîyên dîrokî bi dorê hatîye dayînê. Awa ya yekemîn “Bîkac Can (Xan)”, ya duyemîn “Dermdax kirina (Mala) Salûr Gazan”, yê dawîyê ya 11-în “Ji girtingehê azakirina Salûr Gazan”, ya 12-a “Dijberîya Daş Oxûz ya dijî Îç Oxûzê”.

Bi tomerî di van serhatîyanda, derbarê reşxemilandina çarenusa xanên Oxûzê, yanê jî derbarê mêrxasiya dijî yûnanên ne eyane li berê bera Reş Asîyayê rastî tu binteran derheqa dîroka Oxûzê nayê. Li vira hevanîn xemildar yên ku, bîrada dimînin yanê jî hevanînen taybetî yên derbarê malbetada cî-war bûne.

10. Dema derbarê torîvanda biaxivin, berê her tiştî gotî pêşta bidine kivşê ku, derheqa hemû qewmandinên pirtûkêye cuda-cudada nikarin bêne ser hafiyyên zelalîya wede. Seretayêda mirov awa dişewîne, wekî hemû qewmandin di dewra Dede Gorgûdda qewîmîne. Lê ew tu tiştêkî ji navê xwe qal nake. Ew her tenê car-cara bona şewirdarîyê pêşta tê, daha gellekî dawîya qewmandinanda bona xêyîr-dûa bide Oxûzan tê kivşê, evana jî tene navkirinê "*Oxûzname*". Vegotinên van xêyîr-dûan di dawîya heft bûyerên cudada dixwunî û nikarî bêyî ser çîjan hafiyyê. Ev gilî (*Oxûzname*) li vira çawa pirtûka Oxûzê, yanê jî çawa dîroka Oxûzê wergerînî. Lê gotî evê yekê bipejrinî çawa serdezêdekirina nîvîsara Oxûzê, yanê jî şirovekî çawa derbarê Oxûzan. Wekî her bûyereka tew bi tew bibûya, evê bihata derzêkirinê çawa dîroka Oxûzê. Lê her qewmandinek qewmandinê şûnda Dede Gorgûd çawa qalkirekî sisîya wêya qal dike, her tenê bi pesin û armancên wîye xweşva serhevda tê. Diqewime ku, seran-serîya pirtûkêda zû-zû wekilandina vegotina "*Oxûzname*", xizmetî wî navê pirtûkê kirîye. Diqewime torîvanê pirtûkêyê pêşîn pirtûk bona wê yekê "*Kîtabî-Dede Gorgûd*" navkirîye, ji ber ku, zû-zû rastî xêyîr-dûayê Dede Gorgûd tê. Min jî çend cara



daye kivşê û peytandîye, wekî lêkolîvanên Rohilata Nêzîk ragîhandinên xweye wêjeyîda pîrr cara rast ne bûne. Ji van gişkan wêdatir mirov tê ser wê hafîye ku, pirtûk ji alîyê kesekî sisîyayî ne eyan hatîye berav kirinê. Ev şikberîyê ew yek dide bawerkirinê ku, bûyerên qalkirî bi temamî ji wedên cuda-cuda û ji firqîya dewrêye mayînda kirine bilqe-bilq û hatine gihîştine destê me. Awa qewmandinên ku, li berê bera Reş ku, hatibû serê yûnanan û qewmandinên asîbûna Daş Oxûzê dijî Îç Oxûza, gellekî paşê, lê qewmandinên wedê dundana Oxûzêye hênda qewimîyê çend hezar salan berê qewimîye. Lema jî Dede Gorgûd wê dewrêda nikaribû bibe tevgelê wan bûyeran. Ev dijberî ji pêşnivîsara navkişandîda tê kivşê:

Awa dewsa ku, bê gotinê ku, Dede Gorgûd Oxûzê dawîyê nas kirîye, lê dibên ewî Oxûzên ewlîn nas kirîye, ji ber ku, Oxûzê rikindarê netewî ji sê hezar salan gellektir berê jîye.

11. Ew gişk di bûyera heyştada ya ku, di vê pirtûkêda min şirove kirîye hatîye peytandinê. Ew awa hatîye nivîsarê:

بساط دپه کوری اولدم کی توی بیان ایدم

Livir awa tê gotinê: “Beşa Basat Çavenî diku-  
je beyam dike”. Gavenî mirovekî li enîyê çavek, bi  
pîvandina bedena xwe û bi hêza xwe gewre tê niti-  
randinê. Bi herfî Çavenî, yan jî yê ku, çav li enîyêye  
ev nav (*Schêîtêl-Aûgê*) bona wî çavî stendîye. Ev, li bal  
yûnanan tê navkirinê Sîklop, taybetî bi her alî mîna  
Homêrêye û ew heyâtîke ku, mera daha pîrr agah-  
darîya dide.

**12.** Lê bi ecele binihêrin ku, ne ku, Sîklopê Oxûz  
ji yûnanan tê, lê ya yûnanan ji ya Oxûzan hatîye hil-  
danê. Wekî ya yûnanan tê hesab kirinê çawa dewrên  
hêne-hên, ya Oxûzan jî ew qas nûh nîne çawa li vir  
tê nitirandinê ew bibe nûh demê Dede Gorgûd, ji ber  
ku, li vê beşê Dede Gorgûd naşînîne bal çavenî ku,  
axaftinan bide derbaz kirin ku, dijî Oxûzan dujmintî  
ji holê bide rakirinê, him jî ew li vir peyda dibe ku,  
Basat Çavenî kuştinê şûnda kilamên şên biefrîne û  
xêyîr-dûa bide. Ji alîkî din, destpêbûna beşada der-  
barê Oxûz xanda yê ku, nijata Oxûzane qal diçe, wêra  
tevayî begên Oxûzaye din jî, bi taybetî bavê mêrx-  
asê beşê Basat, yê ku, Sîklop dikuje, Arûz Goca tene  
kivşê çawa nûh demê wî. Ev peytandineke nûye ku,  
Dede Gorgûd her tenê bona dilxweşîyê birine derxis-

tine dewrên hên, ji ber ku, him wagoî heyîtiya Oxûz, him ya Sîklopa yûnanan pirr hêsa bûye. Ne nihêre wê yekê ku, yekbûna rehên dîrokêye wana nikare ne bê şirovekirinê, ne jî femkirinê.

13. Derbarê jîyîna mirovê bi navê Dede Gorgûd tu şikberîya min tune. Lê ew çawa li jorê destpêbûnê da tê gotinê û çawa faktên din dide peytandinê û çawa Oxûzname da tê kivşê, tevî Oxûzên bi dorê yên ku, ji bavên xwe desthilatdarîyê dest anîne dewrekê da jîye. Ez pirr bawer dikim ku, ew beqî temeneye xweyî pirr şewirdarê Oxûzên xweye û wana dipesîne. Ev yek legebê wîyî bavpîr, kalik yan jî bavo jî dide peytandinê. Ez him jî di wê bawerîyê dame ku, ewî gellek qewmandinên hên ji kal-bavên mayî zanî bûye û nûh demên xweva qal kirîye, yan jî bi temamî ji yên naha heyî di bi awakî din hîştîye çûye. Çawa em dizanin ji Oxûz xan virdatir mesele-metelok û qeyd-qanûnên ku, di nava gelê wîda xebitandine cara ewlîn ji aliyê Dede Gorgûd hatîye beravkirin û di Oxûzname da hatîye nivîsarê. Lê ne nihêrî wê yekê, wekî li bal Rohilatdîyada gellek guhartinên dewr-zemîn heye, ne mumkune bê hesibandinê ku, Dede Gorgûd şehedê qewmandinên du hezar sal

berêye, yan jî nûhdemê kesayetên wan dewraye. Ez bawerim ku, ew pirtûk bi agahdarîyên wîye nivîsar, yan jî devkoyî ji aliyê kesekî sisîyê hatiye nivîsarê û ne nihêrî Dede Gorgûd tevî wan ne dewrekêda jîye, di nava merivên temenedirêjda hatiye nitirandinê çawa şewirdarê Oxûzên cîwan, kesayetekî rûmet û bi rêz. Ew yek min dide bawer kirinê ku, Dede Gorgûd li ku derê derheqa xweda qal nake, ew her dem çawa şewirdar, yanê jî mîna yekê xêyîr-dûa dayî peyda dibe. Lê destê meda tunebûna agahdarîyên derbarê dewra torîvan û beravkarê pirtûkê, pêwîste derheqa hênbûna pirtûkêda şikberî neyne holê. Awa, ez dikarim bidime peytandinê, tenê mêzekirina destpêbûna kurt ya derbarê hatina dundana Osmanîan bese. Ev yek ne tenê bi tewlîbûna zimanê tatar-tirk, him jî bi uslûba torîvanêye werîmandî û şaşmayîva tê peytandinê. Awa, ewana her du jî ji Împêriya Osmanîan hênin. Li piştî rûpêlê ewlîn ji aliyê osmanîyek awa navkirina vê yekê diqewime derheqa zimanê Oxûzêda nêta xwe anînê şûnda wê daha zelalbe.

14. Ev xêncî zimanê tatar-tirk ya ku, min destpêbûna Oxûzname da nitirandîye tiştêk nîne. *"Bîranînên derheqa Asîya"* I cild, r.165-166.

Oxûz ew gele ku, cara ewlîn ji yekîtîya Tirk û Tataran hatîye meydanê, ji ber ku, nevîyê Mogûl Oxûz xan ewana her du bin desthilatdariya xweda kiribû yek. (*dîsa li wir, r. 153*)

Pirr salan pey mirina Oxûzê bê şik di gelên wîda veguhastinên pirr qewimîye, ji beşekî wana gelên nûh hatine xuluqandinê, beşek jî navên xwe guhastine ku, ev yek jî paşdemîyêda bûye sedemê xuluqandina zaravên nûh. Lê dumayîna dundana Oxûz çawa xêzeke rast heye. Gelên usa jî hene ku, bin navê Oxûzan zimanên xwe parastine xweyî kirine û dane dahatîyên xwe. Awa, li vir derheqa dewrê hetanî wedê Ertoxrûl bavê Osmanê I yê ku, bingeha dundana Osmanîan ku, naha jî didome danîye qal diçe. Bona evê yekê bidime peytandinê, dikarim ser bingeha dîrokzanên Bîzansê bêjim, hukmdarên wanaye ewlîn bi silsileta xwe girêdayî ji dundana Oxûzan Duz Alp dibe. Kurê wî ku, hukmdarê gelê Oxûz bû, Oxûz Alp (bi awakî din Sulêyman jî tê navkirinê) dijî yûnanan şerkarîyê dibe û di nava wedekî kurtda dibe xwedanê desthilatdarîke bi hêz. Wedê Ertoxrûlê kurê Oxûz Alpêda Oxûzan Tavriyayêda (Krim) gellek axa dagir dikin. Dawîyêda kurê wî Osman navê xwe dide dundana. (Ştrîttêr: *Bîranînên*

*Popûlyar III cîld, r. 531-533*). Ev yek, agahdarîyên ku, Dê Gûîgnês ji Rohilatdîyan berav kirîye mîna hevin. Ew dide peytandinê, wekî Gûzên ku, têne navkirinê turkmen tevî Oxûzan mîna hev bûne, ji wana çend deste çûne Avropayê û hatine nas kirinê çawa Êzan. Yeqîn ku, ev Êzan ji welatê Êzîa hatine û ewana ji alîyê bîzansan hatine tepisandinê Gafgazê. (Ştrîtêr *III c.r. 807*). Van turkmenan Selcûgan jî ji Xorasanê derxistine. Li wir cî-war bûne. Wê şûnda ewana sala cîguhastinêye 611-da (1214 xr.) bi serkarîya Sulêyman şah, yê bavpirê Osmana I ku, li jorê nav hate kişandin, êrîşê leşkerîyêye yekemîn kirine Asîya Biçûk. Lê ewana ji alîyê mongolan paştâ hatinê reqandinê şûnda, hatine Azerbaycanê sala 616 (1219 xr.). Wî Sulêyman şahî bi 5 hezar leşkerava careke mayîn êrîşî Asîya Biçûk dike û Feratêda tê kuştinê. Kurê wî Ertoxrûl li welatê Selcûgêye Îkonîûmêda hukmdarîya xwe dabû miqîmkirinê. Ew, sala 680, ya jî 687-da (1281-1287 xr.) dimire û kurê wî Osman I dibe warîsê wî (Dê Gûîgnês "*Dîroka Hûnan û Tirkan, 4 c.r. 353*). Ji van gişkan zelal dibe ku, rastî jî zimanê oxûzan Ertoxrûl anîye welatê Selcûgan-Îkonîûmê. Lê dîrokzanên destemel, dostên minî buhurî Rays û Reşîd Efendî carekê ez bi zar dane bawer kirinê ku,

wedê Osman bona miqîmkirina Monarxîyayê destpê kirinê dagirkarîyê dora wîda her tenê 2 hezar turkmen, ya jî oxûz hebûye. Ji vir ew hafî dertê holê ku, zimanê Oxûz mîna desthilatdar nikarîbû bimîne, ji ber ku, zimanê selcugan ku, dihata navkirinê zimanê tirk li Asîya Biçûkda zimanê hukmdarîyê bû, neniherî wê yekê ku, axaftîyan di her du zimanada (turk û oxûz) hevdu baş fem dikirin, çawa naha polyak û rûsan dikarin tev hev biaxivin. Bi vî awayî vegotinê zimanê Oxûz xwe bi xwe unda dibe û ji wê şûnda bona Osmanîan vegotinê zimana tirk cî digire.

Çawa Osman navê xwe danî ser gelên cuda-cuda yên ku, di bindestîya xweda û bindestîya warîsên xweda bûn û çû, malbeteke ku, dihate navkirinê selcûg yê ku, wedêda ji Turkmenîstanê hatibû ku, ji serkarên eşîran navkişandî talan bike, navê xwe danîbû ser eşîra xwe. Wekî qal derheqa wê yekêda diçe ku, ew pirtûk bi zimanê Oxûzê hatîye nivîsarê, rewşa wê dewrê hiltînin ber çavan û dikarin bi hêsanî bêjin ku, ev ji Osmana I pirr ewlîn hatîye nivîsarê.

15. Bona ji nêzîk qewmandinên serhatîyê ku, jimarê wî nivîsara nahaye, bibine nas ji welatê Oksûs (dîroka hênda Oks, Cêyhûn (erebanda), parwelata

Amû-Deryaya naha) wêda-rojavaya Asîyayêda di nava Oxûzanda rastî Sîklopekî yê ku, heta naha tenê di yûnanên hênda çawa heyîtîke wagoî tê gerandinê, diqewime her kesîra bi ecêb bê kivşê tê.

16. Yûnanan derbarê 3 cure çavenî yê ku, li enîyê çavekî bijiqî heye qal dikin. Ewana beqî çavê mezin, bijikî ku, di nava enîya wanda cî-war bûye hatine navkirinê. Çawa Polîfêm (Çavenî) kotana dirêjaya 200 fût, ji dara dore here mezin gewre dikaribû destê xweda bibe, ewana jî mîna dêvên bêtewşe têne nitirandinê. Ewana têne kivşê çawa mirovên hov û rezîl ku, ji vê yekê jî jîyana usa der tê holê ya ku, tu qanûn, erf-edet û tu ol-dîn nasnake-gotina “jîyana Sîklop” çawa mesele-metelok pêşta tê. Ev, qenderên tomerîye ku, derbarê hemû Sîklopadeye.

17. Cura yekemînda Argos (di mîfologîya yûnanêye hênda lehenga pirçave), Brontês (Xwedeyê gavxweş, tê nas kirinê çawa kurê biçûk yê Zêvsê) û Stêropês cî digire. Bi gotinan wana Solûs (Xwedeyê gunêş) tevî jina xwe Erd xuluqandîye. Ewana ne Xwedêne, lê dihatine şêwandinê çawa xwedê. Ewana ji alîyê bavê xwe Solûs hatine girêdanê û avîtime cehennemê. Lê Yûpîtêr wana aza dike ku,



wîra Bêlêmnît (kevirê birûskê) çêkin. Ewana him jî mîna hesinkarên xulam xizmetî Vûlkan dikirin û li grava lûpara destçêxana wan hebû. Wana ji ber ku, Bêlêmnît çê dikirin ji alîyê Apollo (xwedeyê ronayî û zanêyî) têne kuştinê.

18. Tu karê me tevî van Sîklopên mîfolojî tune. Him jî kesek nizane ku, derheqa wanada çî bifikire. Ewana ji alîyê helbestvanên yûnanan çawa navên hişk hatine pêkanînê, paşê jî helbestvanên Romayê ji wana çawa xwestine usa jî pêk anîne, ev jî di nivîsarên wanda pirr bînteng tê kivşê. Bê şik di nava wanda revayetên heqîqî jî hene ku, wana niştemanên yûnanêye ewlîn ji rohilatê anîne, yanê jî dundana wanaye paşdemîyê ji welatê Rohilatê berav kirine. Lê ji van revayetan hinek bi guhastinên navên, hinek bi guhartina gotinên zimanê yûnan, hinek jî ji alîyê muherrîran ser xatira dilxweşîyê serda zêdekirin û kêmasî hatîye kirinê û ketine rewşa ne naskirinê. Awa xwestina wê yekê ku, qewmandinên hên û kesayetên ku, bûne revayet vegehrîninine cilê xweyî ewlîn xencî ezîyete bê feyde tiştêk nîne. Pêwîste ew yek usabe ku, çawa Makrobîûs û Sîsêron dibêje yên ku, hatine navkirinê leheng û bi metirsî têne mêze kirinê

bê ar bêne hesabkirinê û awa bê kivşê paşdemîyêda Xwedan xwestine wana ji cîyên xwe biqewtînin.

19. Cura duyemîn ya Sîklopan merivên huner-mendin, yên ku, dikarin avayên hêle çêkin, serhevda bînin. Bi gotinan li welatê Argûsêda rastî jî bajarê Tirinf hebû ku, ew ji alîyê Praotusek tevî heft Sîklopan yên ku, ji Lîkîya (li Asîya Biçûk dewlet) hatibûne gazîkirinê hatibû avakirinê. Kevirên here biçûk yên sûra dora vî bajarî dikaribû ji alîyê çend heywanên barkêş bahatda anînê. Tê zanînê ku, karên dîwarê ya bajarê Mîkene jî ji alîye wanda hatîye qedandinê. Strabon qêyd dike ku, şkeftên ku, di navda sê labîrînt heye nêzîkî bajarê Naûpla jî şuxulê Sîklopaye. Vê weteyêda karên bi ecêb û nebînyayî qedandinê evê yekê nav dikin “leystîna leystîka Sîklop”. Di bal mirovên awada ne derbarê ecêbîya wanda, ne jî derbarê yekçavîya wanda diaxivin. Pêwîste ew bêne nêhrandinê lehengekî çawa Sîklop.

*“Roburque et vires et doli erant in operibus.” – Hêza mêt û ya fen-fêla dema kar tê kioşê.*

20. Li vira pêwîste Albanên ku, di nava Îbêrîyaya Rojava û Xezera Rohilatêda dijîyan bêne ber çavan, lewra ku, wanara digotin jîyana Sîklop xwera kirine

edet, ji ber ku, ewana bêjinbilind bûn, him jî heywan xweyîkirin û çandinêva mijûl dibûn. Ji ber ku, Sîklopan didan kivişê çawa mirovxwer, piranîya Skîfên ku, nêzîkî bakûr dijîyan navdikirin Sîklop, lema jî ewana dihatine tawanbar kirinê ku, mirov dixwin.

21. Cura Sîklopan duyemîn nêrîneke tomerîye û rastî nîne, ji karên xwe pîr navên xwe çawa mirov û eşîrên heyî mera danîne çûne. Li vir yê ku, himberî yên Oxûzan bona me daha nêzîkbe dikare tenê kesekbe. Binihêr ev ji Sîklopa bi navê Polîfêm yê Homêrê sêyemîn cuda tiştek nîne. Sîklopên din yên ku, di girava Trînakrîa, yan jî Sîcîliyayêda jîne dikarin hesabkin çawa ji curê duyemîn ya ku, jorê hate kivişê, lewra hinek ji wana ne ji alîyê Homêr hatine nitirandinê, ne jî beqî ecêbîya ji alîyê tu muherrîr ne hatine ber çav kirinê.

Ji her tiştî berê hemû agahdarîyên kevn:

Sîklopên Sîcîliya niştamanên gravêye yekemînin, weke 100 sal ji Pêleg şûnda ji Îtalîyayê hatina wana û paşdemîyêda ji alîyê Ponîkîran xuyakirina wana çawa niştamanên yekemîn hevra weke hev tê. Awa ev Sîklopan bi cura xwe dikarin bidine kivişê çawa xizmetkarên hesinkar ya Vûlkanê. Derbarê dîtina

wan ew yek ferz tê zanînê ku, ewana pîrr leheng bûne û weke hev kirina wana tevî sklêtên ku, ji tirban hatine dîtînê tu şikberî pêşta nayne. Ev yek herî kêr ew firsent dide ku, Sîklopên cura duda yên yeknav cuda bikin. Zinarên Siklopûm skopûlî ya ku, wana lê jîne naha tê navkirinê Faraglîonî. Nêzîkî alîyê bakura Katanîya li bera rohilata Val dî Dêmonên sê zinarên awa heye.

22. Ka binê du Sîklop yê Oxûzan û yê Homêr cîjan gavada weke hevîn û çijan taybetîyêda Homêr diseqire. Lewra em livir daha pîrr ji çavenî hîn dibin, ne ku, ji Polîfêm.

23. Şivanek Oxûz (*dewrên hênda ew, dihate hesabkirinê çawa mirovekî bi rûmet*) rojek ji rojan tê ser kanîyekî ya ku, keçên perî dorda civîyabûn û ji wana yekê disêwirîne. Perî kurek tîne dunya ku, ew jî pîrr leheng dibe û li enî çavekî tek dibe, lema jî wî navdikin Çavenî.

24. Homêr Polîfêm hesab dike çawa kurê Nêptûn, buhurîya wîda tu elamêti ne dide. Ne nihêre wê yekê ku, hinek hesab dikin ku, Nêptûn wî tevî Nîmfê Toza, yanê jî tevî Amfidrîtê, hinek din dibêjin tevî Êlatûs (wagotî dîya Polîfêm), Nîmfê Stîlbê, yan jî

tevî Amînônê anîne dunya, lê rastîyêda kurê Êlatûs ji Argonavtane (Argo navê keştîye) û pêwîst bû ku, ew bibe meriv ku, li keştîyêda malê wî bibûya.

25. *Rissi* dîss 51.awa dişêwîne ku, bona xwe bi-parêzin, binhêrin der-dora xwe rewşa bihêjînin û erîşî cîranan bikin wan talan kin, yekçav bûna wan allêgorîyaye. Vê nêtêda mentîq tune. Cîyê xweda raste, yan jî şaşê:

Her du Sîklop bona wê yekê yekçav têne radest kirinê ku, paşê ji wan bikaribin bêne mehrûm kirinê. *Rissi* dîsa serda zêde dike ku, bi gorîya şhedên pir-jimar mirovên yekçav bûne. Ev yek çiqas raste, bona me firqî tune, lewra evana Sîklopên ku, livira em qal dîkin nînin.

26. Kurê ku, zayîne şûnda dayîk Perî pêçandî danîbû çûbû-çavenî, begên Oxûz rex kanîda dibînin û yekî bi navê Arûz Goca wî, hiltîne ku, tevî lawê xwe Basat toreke. Lê dayeyên cuda kirî bi hêz mitina wîye çîçîkan temûl nakin dîmirin. Giring dibe ku, wî bi awakî din bidine xwerinê. Ew mezinbûnê destpê dike guh û pozên hevalên xweyî leystîkê û yên lawên din dixwe. Bona vê yekê jî ji mal tê qewtandinê.

27. Di Polîfêmê Homêrda û yên dinda di jîyana vê dewrêda bi temamî nêt nayê dayînê.

28. Çavenî ji aliyê Oxûzanda qewtandinê şûnda diya wê tê bal wî, kustulek lê beçiya wî dike ku, bi hêza wî ew, ji şûr û tîran neyê birîndar kirinê. Ew xwera amin dibe, li çiya bi navê Qara dax-Şvartsbêrg cî-war dibe û bi şêlandinêva jîyan derbaz dike. Derbarê ne birîndarbûnêda Polîfêmêda tu tişt nayê zanînê. Weke hevbûna Çavenî tevî wî wê yekêdaye ku, li serî çiyada dijî û jîyana bê qeyde, yan jî jîyana Sîklo-lop debaz dike.

29. Plato (Platon) awa hesab dike ku, berêda mirovan ji ba-bager, ji lê tirsîyane li lûtkeya çiyanda jîne, lema jî Sîklopan li serîya çiyân dane rûniştandinê. Tenê paşdemîyêda deştêda û dawîyêda jî nûva berên berrda cî-war bûne. Lê ew yek çawa dijî qewmandinanêye:

Seba wê yekê ku, Sîklopan ji teqîba mirovan çê benê parastinê li çiyayên dest negîhîştîda cî-war bûne ji ber ku, ewana jîyana hov didan derbaz kirinê.

30. Bona têrbunê Çavenî mirovan û heywanan didize, dixwe. Oxûzan bona wî hûrxweşkin heft car

yek dibine. Lê her car alt dibin. Bi darekî mîna dare yûnanêye dor (ya keştîyan), ya ku, ji erdê derxistîye hildaye, pêncî-şêst mirov bi carekêva dikuje. Tîr, şûr, nîze tu bandor wîra nakin, beden - terme wîda dişkênin.

31. Polîfêm rastî derbên awa nehatibû. Hemû binelîyên grava Trînakrîa têne nitirandinê çawa dostên wî. Îlîada jî tevî hevalên xwe culetî karekî awa ne kiribûn.

32. Lê Oxûzan berbûna tevî Çavenî nikarin awa hereket kin. Berê ew bona xwerinê her ro şêst meriv dew dike, lê bi 2 mirov û 500 pez, ya ku, Oxûzan rojane bidine wî qayîl dibe. Xencî wê yekê pêwîst bû ku, bona mirovan û pezan biqelînin-sorkin du Oxûz jî bidana wî.

33. Bi gorîya Homêr, xêncî xwerina hertimî Polîfêmê pez û bizin, ya ku, gravêda bê jimar kerî hebû, bi taybetî şîr, penêr dixwer û şerab vedixwer, wêra tevayî nan dixwer tu tişt eyan nîne. Her tenê Îlîada tevî 12 hevalên xwe maxara-şkefta Polîfêmê hatinê ew, dixweze sibe û êvar du hevalên wî sorbûna wana jî çavra neke û xavî bixwe.

34. Heta dor digihêje jineke bi temene ku, kurê xweyî yekemîn dabû Çavenî û naha jî yê duyemîn, him jî yê dawîyê bide peyman didome. Ev jin Basatra, yê ku, çendek tevî bi Çavenîra mezin bibû û berêda şêr wî dabû metinê şîkayet dike. Ne nihêre wê yekê ku, dê-bav û hemû begên Oxûzê dixwezin wî ji vê karê ku, ne mumkune bidine vekişandinê, Basat biryar dipejrîne ku, Oxûzan ji vê bela xilazke. Bi tîr û şûrva çekdar dibe diçe zinara ku, çavenî lê hewirîye. Ew bê feyde tîr tavêje û çavenî bona ku, wî êvarê bide sorkirinê bixwe, wî digire dibe şkeftê.

35. Îlîada tevî hevalên xwe bo xatirê hewaskarîyê Polîfêm hundurda nebûnê diçe şkefta wî, ya li grava Trînakrîya. Berêda li tu kesî dijî Sîklop nêteke xirab tunebû. Di nava Îlîada û Basatda tevayî ew yek heye ku, her du jî têne girtinê, li şkeftêda xweyîkirinê û her tenê derbarê xilazbûnêda mitale dikin.

36. Basat ji derblêxistinê derbazî parastiinê bûne û ji xizmetkarên çavenîyêye eyan hînbûnê şûnda ku, ew her tenê dikare ji çavê xwe bê birîndar kirinê, bona çavên wî bişewîtîne kunke şûra xwe li êr mîna dirav sor dike, wede wîye li xewnbûnê dijêre. Çavenî usa diquire ku, ji çîyan eks-seda tê.



37. Livira em di nava Îlîada û Basatda weke hevbûnek dibînin: ew jî li şkeftda mayîne şivek zêytûn li êrda dişewitîne, dike çava Polîfêmê ku, razaye û ji êş qurînîya Sîklop zinaran dipêçe.

38. Li Çavenî û Polîfêmda ew yek nêrîn dikişîne ser xwe ku, wana her du çawên wan şewîtandin kunbûnê şûnda, xêncî êşa ewlîn ku, wana dide qurandin, ji tu nesazîyê ezîyyet nakişînin.

39. Li Polîfêm pirseke usa tê danîne ku, çima Îlîada wî nakuje, her tenê ji çav merûm dike. Li Homêr bixwe bersîv awaye ku, Îlîada û hevalên wî zinara mezin ku, li pêşîya dêrîyê şkeftada bû nikaribûn wî têhildin dêrî vekin, lema jî pêwîst bû ku, Polîfêm bijî. Li pêşberî dêrîyê Çavenî zinareke usa tunebû. Lê mumkun bû ku, her tenê Çavenî ji çav bê birîndar kirinê, bona ku, Sîklop jîyanêda nemîne û dijberî pêşta neyne pêwîst bû ku, Basat xwedî derkebe şûra wî jî.

40. Çavenî bona ku, xwerina Basat ji dest nede pêyekî xwe datîne vî alîyê dêrî, ya din jî datîne wî alîyê dêrî û destpê dike beran berdide der. Vî çaxî amin bibe ku, Basat derneketîye ji serîyê her beran digire.

41. Polîfêm jî weke wî dike, pêşberî derîyê şkeftê rûdine û bona Îlîada û hevalên wî ji şkeft derketinê bigire bi destên xweva beranên derbazbûyî vedini-hêre.

42. Basat bona ku, Sîklop bixapîne beranek serjê dike dû û serî li ser ji post dike, dikebe nava post tê pêşîya çavenî, serî dirêjî destê wî dike û ji nava lingên wî pazdide derbaz dibe.

43. Bona Îlîada şeş hevalên xweyî mayîn azake sê beran hevra girêdide ji wana her car beranê orta gotî hevalekî wî bibira. Xwera beranekî bi hirî û here bi hêz ku, bikare bin zikê xwe dardake dijberê û bi vî awayî ji şkeft derdikebin. Hinek dikarin bi ecêb bimînin ku, Îlîada û hevalên wî her yek çawa dikarin ji alîyê beranek bêne birinê. Hinek din jî awa hesab dikin, wekî li Sîcîlîyayê beranên usa mezin hebûye ku, ewana karibûne bara hespekî bibin. Ev bi alîyekî, lê ez bawerim ku, Basat ji qismetekî çarenûsêye herî baş pêk anîye ku, ev jî bona heft mirov hev nedigirt. Ev jî dikaribû bibe sedem ku, Homêr çima vê yekê nebijartîye.

44. Di nava Çavenî û Basatda axaftinên cuda-cuda tê birinê ku, bi vê yekêva jî yê yekemîn dicedîne yê

din altke. Lê evê yekê serê xwe nagire, dawîyêda ew çok dide û sêrîyê xwe Basatra bi şûrê xweva dide jê kirinê. Ev yekê di pêhatîyêda ku, paşê hatiye dayînê dikare daha bi her alî bê xwendinê.

**45.** Ev yek tevî Polîfêm weke hev bikî, lewra Îlîada ji destê wî derketinê şûnda beranan dibe keştîya xwe û ji wir dûr dikebe. Her tenê ew ji avê gilîyên tinaz dibarine ser Polîfêm. Bona vê yekê jî Polîfêm dû wî parçayên zinar davêje û wî gef dike ku, metirsîyên nûh bîne serê wî. Ev kirina Îlîada jî çawa bêaqiltî rexne dikin. Her tenê ez vê yekê serda zêde dikim ku, Çavenî jî bona hêza xwe bide kivrê kirineke awa kiribû, valayeke zinar, yan jî gumbez ya ku, xezina xwe li wê bû bi derbê destê xwe herîfandibû ku, Basat têda çelke. Polîfêm jî çav sax bûnê navê Îlîada pirsînê, ew şaş bersîv dabû. Lê Çavenî çavê xwe unda kirinê şûnda ev pirs dabû, Basat navê xwe rast gotibû û ew tawanbar kiribû ku, çiqas neheqî anîye serê malbeta wî.

**46.** Ji vê wekehev kirinê bi hêsanî dikarin bêjin ku, torîvanê Oxûz-ew çawa tê navkirinê bila bê-û Homêr ji lenehgekî diaxivin, yan jî mijara bingeha her du pêhatî yeke. Lewra qewmandinên efsaneyîye

usa li cî û zemanên cuda-cudada biqewimin jî, nikarin bi tesadufî ev qas nêzîkî weke hev bêne qal kirinê. Raste, bingeha ev weke hevbûnê bi faktên zelal û bêhucetêva dibe mîna bawer kirî. Lê sedemên usa hene ku, têra min nakin, ewana nana dikin ku, Sîklopa Oxûz ji ya Homêrê hatiye rûderxistinê.

Wana ya jêrîn:

47. Ya ewlîn, Rohilatdîan tu wede tevî mîfologîya yûnanan nas ne bûne. Bona wê yekê ewana nikaribûn karpêkên Homêrê wergerînin, ji ber ku, ji alîyê mîfologîya ev yek bona wan yeke nefem kirî bu. Zimanên Asîya bixwe ji ev gotinan pêwîst nana dikirin. Aklîan "Agahîyên dîrokî" XII r.48 dide kivşê ku, fars û hîndîyan hez dikirin helbestên Homêr bi zimanê xweda bixwînin. Lê ew xwe jî ev yekê hindik bawer dike û serda zêde dike, wekî yên ku, derbarê wê yekê da agahdarî didin tu bingeha wana tune ku, bêjin ev yek rastîye. Ebdul Ferec jî "Dîroka dundan" r.40 ji wergerandineke Sûrîya gilî vedike. Ev Ebdul Ferec di rûpêla 148-a qeyd dike ku, ew du pirtûka Îlîadaye, yên ku, ji alîyê Têofîl Astronomûs fon Êdêssa paşdemîyêda hatiye wergerandinê. Çawa Fabrîkîûs li karpêkê xweyî bi navê "Bîbliografîyayê Yûnan" r.

250-da dibêje, di lîsêya pirtûkên Sûrîyayîyanda tu wede derbarê van parçayên biçûk rastî tu agahdarî nehatine. Dîo Krîsostomûs di orîtorîya 53-da wergerandina hîndî ya efsaneyê diweklîne. Lê ew bixwe jî ev yek nana dike, serda zêde dike ku, gellek brahman navê Homêr bîhîstîbûn, lê nedizanîyan ew heywaneke, hêşînayîke, yan jî tişteki dine. Lobbê Bibliografîya xweye nûhda r.257-a di nava destnîvîsarên pirtûkxana Vatîkanêda navê Homêrekî fars dikişîne, gotî, ev yek bê hêjandinê çawa derewekî zelal. Homêr ku, bona Asîyayîyan bi rêya wergerandinê melûm ne bûye, wê çaxî serhatîyên wîye derbarê Polîfêmda jî wanara nas ne bûye.

48. Ji alîkî din jîyana Sîklopa Oxûzê ji destpêbûna hetanî mirinê bi hûr-gilî hatîye dayîné. Lê serhatîya Polîfême ya Homêrê himberî vê tê kivşê çawa beşek, yan jî çawa qewmandinek.

Livir jî bi zêdekarî nêtên hevbeş der tene holê, yên ku, dikarin weke hevbûna mirovan bidine peytandinê. Bi zelalî tê kivşê ku, derbarê qewmandinêda agahdarîya torîvanê Oxûzê ya ji agahdarîya Homêrê zêdeye. Wekî ev efsane ya Oxûzan nîbûya, torîvanê Oxûzê yê ku, nav û kesayetîyê wî mera ne eyane,

çawa dikaribû, evê yekê awa bi tamamî û bi heralî bîgîhanda me. Awa, ev, hetanî dewrê Dede Gorgûd bi nivîsarî jî nîbe, bi devkoyî hatîye gihîştîye û ji alîye torîvanekî ne eyan ketîye nava tomerîya serhatîyan Oxûzêye eyan.

49. Lema jî ez bawer dikim ku, Homêr wede gerîna xweye Asîyayêda çîroka Çavenî bîhîstîbû. Herçend tevî wergervan axaftinê, wê çaxî ev yek natemam dibe ku, ewê jî xwestîye qenderên bingehî bide Polîfêmê xwe. Diqewime vê qewmandinê nêzîkî Îonî ew bixwe bîhîstîbû. Lewra eşîrekî Oxûzan, kê zane bin çîjan navêda, hevkarê Prîam bûye û wedê dorpêçkirina Troyayê dijî yûnanan şer kirîye. Bi vî awayî jî çîroka Çavenî hatîye anînê Asîya Biçûk û wede Homêrêda çawa bîranîneke nûh pirr mayînde bûye. Lê Homêr ji vê yekê çawa xwestîye usa jî pêk anîye. Ev yek eyane ku, çîrokeke Sîklopêye tew bi tew, ya ne girêdayî Homêr, di nava gelên ku, navdikirin barbar bi firetî hatibû belakirinê û bona vê yekê jî rewakirina wana tevî yên ku, nivîsarên yûnananda tene xwendinê dibû neheqqîke mezin. Min ser bingeha hinek agahdarî û nitirandinên zanîyarîye yûnanan dame peytandinê ku, ewana ji Ro-

hilatdîyan Nêzîk hatine hildanê. Livir em ji Asîya paş pêhatîyek ku, hatîye wergerandinê bûye çîrok, yan jî efsane, dibînin ku, yûnanan ji vê axaftinê tu têklî tevî navê Sîklopan çê nakin. Ji ber ku, wana ji 3 cura Sîklopan gilî vedikin, lê nikarin yeke tew bi tew biefrînin, ya ku, Oxûzan mera hîştine çûne.

50. Bi vî awayî lêhrandinê, min xwest ku, qewmandinên ulmîye hên, pêhatîyên mirovayî yên ku, tu wede Avropayêda ne hatine gotinê, radestkim çawa bîranînên derbarê Asîya. Bona ku, karê ulmdarên dahatî sivikbe ezê metna orîjînal bi wergerandina gilî bi gilî serda zêdekim. Diqewime kesek ew ziman bizanibe û nivîsarên Rohilata Nêzîkêye dinda derbarê Sîklopa Oxûzda agahdarî bigere, wê çaxî dikare livira rastî weke hevbûna Sîklopên Asîya û Yûnanan bê û hetab be. Wekî dahatîyêda yên ku, ji vê yekê pêk bînin mera hindik jî be şêkirdarbin, wê çaxî ew yek eyan dibe ku, zehmeta kişandî badilhewa nebûye. Di orîjînala ku, ji destên çend rûderxistîyan derbazbûye şaşî hene ku, pirtûkên hên bê vê yekê nabin. Ez wî weke zanebûna xwe çap dikim. Lê li vir jî şaşîyên ku, bi lezgîn nayêne dîtîne menî dixalifin, yan jî bi temamî nefemkirî dibin hene.

51. Bona wê yekê jî, Homêr wedê seredana li Asîyayê çîroka Çavenî bihîstîye. Diqewime ji ber ku, Homêr ev çîrok ji zimanê wergervan bihîstîye bûyer tew bi tew ne gihîştîye wî, lema jî ew her tenê qenderên bingehî daye Polîfêmê xwe. Lewra kî dizane qebîleke Oxûzan bin çîjan navêda hevkarê Prîam bûye û dema çarmedora Troyayê dijî yûnanan şerkarî kirîye. Bi vî awayî çîroka Çavenî hatîye anînê Asîya Biçûk û Homêr ji wî bi xwestina xwe pêk anîye. Awa der tê holê ku, çîrokeke Sîklopê tew bi tew bê Homêr di nava hinek gelên barbarda bi firetî bela bûye, bona wê yekê jî qewmandinên ku, li nivîsarên yûnananda tê xwendinê bê edlayîke mezin dibe ku, rewayî wana yûnanan kin. Min ser bingeha hinek agahdarîyên ulmîye yûnanan daye peytandinê ku, ewana ji Rohilatîyên Nêzîk hatine hildanê (*"Gabûsname"* r.441. *Qeyd* 2.615. *Qeyd* 1 û 824. *"Pirtûka nivîsarên Krallixê"* r.20. *Qeyd* 1. *"Bîranînên derbarê Asîya"* c.1, r. 1-2). Li vira em çîrok ya jî serpehatîyek girêdayî Asîya dibînin ku, yûnanan ji wê yekê bi navê Sîklopan ku tu têklî tune diaxivin. Ji ber ku ewana ji 3 cure Sîklopan qal dikin jî, lê yeke bi tew ya ku Oxûzan mera hîştîye çûye ne karine biefrînin.



52. Ji wê alîda mêzekirinê tê tirê agahdarîyên pirsên mirovayîye hên ku Avropayêda nehatine ser zaran mîna bîranînên derheqa Asîyayêda tê radest kirinê. Bona ku karê ulmdarekî ayînde bidine sivik kirinê metna orîgînal gîlî bi gîlî zêde dikime ev pirtûkê. Ger kî ew ziman dizane û dixweze derbarê Sîklopa Oxûzada agahdarîke dest bîne, dikare ji wekehevbûna Sîklopên Asîya û yûnanan pêk bîne û hetab be. Ev yek ne keda unda kirîyêye. Bona tarîyên hên ronkin kesên ku, ji wê kedê pêk bînin hindik-be jî şêkirdarîyên xwe mera bidine kivşê. Di hinek orîjînalada ku, ji destê çend kesan hatine nivîsarê jî şaşîyên pîrr hene ku, di pirtûkên hênda bê vê yekê nabe. Ez wê çawa dizanim usa didime weşandinê. Lê li vira jî gîlîyên şaş hene. Di gîlîyên awada varîanta here baş ku, min pejirandîye di bendêda dame. Şaşîyên biçûk ku, di wergerandina minda hene, ji alîyê kesên ku, ziman zanin bi hesanî bêne femkirinê.





**BOY-BEŞA KU,  
BASAT ÇAWA  
ÇAVENÎDIKUJE**



Xanê, rojekê Oxûzan bêhay warên xweda runiş-tibûn dujmin hate ser wan. Ewana ditirsiyan hema şev bardikirin. Wedê direvin diçin rêda kurê Arûzê kal yê biçûk rêda dikebe dimine, şêrek wî dibîne, hildide xweyî dike...

Wedekîşûn da gelê Oxûz disa vegeyîya cî-warên xwe. Rêvovanê Oxûz, tê, bersivê tine. Got: "Xanê min, ji nava qamûşa şêrek dertê, bazdan-reva wî mîna mirovane, lê dide hespê dike bin xwe, xwînêdî-mijê."

Arûz got: "Xanê min, diqewime wedê em ji cîyê xwe revinê ew kurê mini xizanî unda bûyîye?"

Began hespan sîyar bûn. Hatine ser xwegeha şêr. Şêr dane revandin, kurik girtin. Arûz kurê xwe anî mala xwe. Şayî derbazkirin. Xwerin-vexwerin. Lê

çiqasî rind li kurik nihêrin, mist kirin, ew nese kinî, revîçû xwegeha şêr. Careke din ew girtin anîn. Dede Gorgûd hat. Got: "Kurê min, tu însanî. Tevî heywana neaxive. Were, hespên rind sîyar be, tevî mêrxasên qenc bide rikêfa. Navê birê teyî mezin Giyan Selcîke, bila navê te jî bibe Basat! Navê te min da, temeneyê te Xwedê bide."

Rojekê gelê Oxûzê barkire zozanê. Şivanekî Arûz hebû. Navê wîra digotin-kalê xurî bi xurîşivan Sari. Ji wî pêştir tu kes berê ber Oxûzan derbaz nedibû. Kanîke bi navê "Kanîya dirêj"-e navdar hebû. Perî xerîcî bûne ser vê kanîyê. Nişkêva pez herikî. Şivan ser nêrîyê pêşin hêrs bû, pêşta çû. Dît wekî keçên perî bask hevra dane girêdanê difirin. Şivîn yapinciyê xwe avîte ser wana. Keç Perî girt. Medê wî çû ser wê, ewa hemê kir. Pêz destpêkir herikî. Şivan revî pêşîya pêz. Keç Perîyê baskên xwe hev xist firî. Got: "Şivan, sal xitim bûnê, were emenetê xwe ji min bistîne. Lê te bela anî serê Oxûzan." Pirsê Şivan hingavt. Lê ji keçikê qetîyanê rengê wî spîçolkî bû.

Wede hat, Oxûzan dîsa barkirine zozanê. Şivan dîsa hate wê kanîyê. Dîsa pez silikî. Şivan pêşta hat. Niherî telte goşt razaye, xwe jî birq vedide. Keçperîyê hat got: "Şivan, emenetê te eve, were hilde! Lê te bela

anî serê Oxûzan. Şivîn ew telte goşt dîtînê eceb ma. Paşta vegeî, bi kevira da ber kewkîyan. Her ku, lêda, ew mezin dibû; şivîn ew hîşt revî, kete pey pêz.

Tu nebê, wê demê Bayindir xan tevî beqan derketîye gerê.

Hatine ser wê kanîyê. Mêze kirin tiştêkî bi ecêb razaye, serî-pîyê nayê zanînê. Dora wî girtin. Mêrxasek ji hespê peya bû, ew hejand, lêda. Her ku, wana lêda ew mezin dibû. Arûzê kal jî peya bû, lêda, hejand, nişkêva mahmiz li wî tiştî ket. Perda ji vî telte goşî qelişî, ji hundur zareke kurîn derket.

Gewde gewdê mirovan, li enîyê çavek hebû. Arûz ev zarok hilda li pêşa xwe pêça. Got: “Xanê, vî bide min, tevî kurê xwe Basat mezinkim.”

Bayindir xan got: “Bila yê tebe.”

Arûz çavenî hilda anî mal. Kerem kir, dayek hat. Dayeyê memikê xwe kire devê wî. Zarokê carekê mijî, şîrê heyî vexwer. Çara duda mijî, xwîna wê vexwer, çara sisîya ruhê wê stend. Çend daye anîn. Çavenî ew kuştin. Dîtin wekî nabe, gotin bi şîr xweyîkin rojê beroşek şîr têrê nedikir.

Xweyî kirin, mezinbû, destpêkir gerîya. Tevî kuran dileyîst.

Zareke pozê wî xwer, zarekê guhê wî xwer. Werhasil, gel ji destê wîda hate zarê. Belengaz bûn, dew ji Arûz kirin. Arûz çavenî kuta, cêr lê kir, hereketê wîyawa dirix kir. Çavenî gilî nebihîstîn. Dawîyêda Arûz ji mala xwe bere wî da.

Dîya çavenî Perî hat gustîlek kire tilîya kurik. Got: "Lawo, bila tîr noqî te nebe, bedena te şûr nebire."

Çavenî ji nava Oxûzan derket, li çîyakî bilind cîwar bû. Rê birî, mirov dizî, bû rêbirekî mezin. Çend mirov şandine ser wî. Tîr avîtinê, noq ne bû. Şûr lêdan, nebirî. Sungu têra kirin, neçûyê. Şivan-mivan nema Çavenî gişk xwer. Destpêkir ji nava Oxûzan mirov xwer. Oxûzan berev bûn hatin ser wî. Çavenî ew dîtî hêrs bû. Darek derxist, li cîda avît, pêncîşêst mirov kuşt. Derbeke usa li serkarê mêrxasa Kazan xist, dunê li serê wî teng bû.

Birê Kazan Karagune ji deste çavenî altbû, kurê wîyî ber-xwedayî Alp Rustem hate kuştinê. Pehlevaneke mîna ewledê kalemer ûşûn bi destê wî hate kuştinê. Du birê wî li bi destîçavenî ji holê hatine rakirinê.

Mamagê dêre hesin bi destî wî hate hildanê. Simel palik Bûkdûz Emen jî alîyêçavenîda hate alt-

kirin. Çavenî bi kalemêre rîdan sipî Arûz xwin da vereşandin. Ziravê Gijan Selçîk hate birindarkirin. Oxûzan nikaribûn tiştekiçavenî bikin, ketine xofê revîn. Çavenî pêşîya wan girt, paşda vegerand. Awa, Oxûzan heft cara revîn. Çavenî heft cara pêşîya wan girt, paşda da rûniştandin. Warê Oxûz destê Cavenî-da ma nava heşir-meşirêda. Çûn gazî Dede Gorgûd kirin. Wira axivîn: "Warên wîra parê cudakin, xerc bikişînin. "Dede Gorgûd şandine bal çavenî. Hat selam da. Got: "Lawo, çavenî, warê Oxûz destê teda maye di nava xerbendîyêda, wêran bûye. Ez şandime ber pîyên te. Got, wede bi wedê parê bidine te."Çavenî got: "Herro şêst merivî beravkin bidine xwerina min. "Dede Gorgûd got: "Bi vi hesabî tuyê meriva nehêlî, tuyê gişka buxwî xilazkî lê herro du meriva û pencsed pez dikarin bidin."

Dede Gorgûd awa gotinê Çavenî got: "Bila, bila usabe! Lê du mirova jî bidin bila xwerina min bipêjin, ez buxwim."

Dede Gorgûd vegeerî hate warê Oxûz. Got: "Kakê Bûnlû tevî kalikê Yanagli bidine çavenî, xurekê wî bipêjin! Yek jî ew herro du mirovara tevayî pênc sed pezî dixweze." Cimaet qayîl bû. Kêçar kur hebû, yek



dayê, sisê ma. Kê sê kur hebû yek daye, dudu ma kê du kur hebû, yek dayê, yek ma.

Mêrekî bi navê Ganaggan hebû. Du kurê wî hebû. Kurek dabû, yek mabû. Naha dor hatibû ser wî. Dê xwe diperind, şewat bi şewat digirîya. Tu nebê, xanêm: “Basatê kurê Arûz çibûye şêr, vê demê hatîye.”

Dîya kurikan got: “Basat naha ji cengê, ji girtin berdanê hatîye, herim diqewime xerbendekî bide min, kurikê xwe bidime xilazkirinê.”

Basat sîgirta xwe zêrîn vegirtibû rûniştibû, dîtîn jinek hat. Hate hundur, çû bal-Basat, selam da, girîya. Got:

Tîrên bi lek kefên destê te hilnayê,

Ji sturuyê nêrîyê mezin bertir kevanê te heye.

Li îç Oxûza, Daş Oxûza navê te eyane,

Kurê Arûz, Basatê mêrxas alîkarîyê bide min!

Basat got: “Çi dixwezî?” Jinikê got: “Lê vê dunya bê bawar mêrek derketîye meydanê. Nehîşt êla Oxûza derkebe zozanê. Şûrên ji polade tûj pirçeke wî nebirî.

Yên ku, nîzeyên mîna qamûs didane leystîkê cermê wî qul nekirin. Tîrên ji darên qayîna avîtînê, tu karek nebû. Ewî derbek li serkarên mêrxasan Gazan xist. Birê wî Garagun bi destî wî hat hicirandin. Simêl palik Bukdûz Emen bi destê wî hate kutanê. Xwîn bi rîdan sîpî Arûz da veraşandinê (bav) li meydanê ziravê bire te Giyan Selçîgîn birindar kir, ruh da. Bey yên Oxûzêye mayîn hinek seqet kir, hinek westandin. Heft cara êla Oxûzê ji cîyê wan da revê. Xerc xast, stend. Naha herro du mirovan, pênc sed pezî dixweze. Kalikê Bûnlu tevî kalik Yanagli dane wîçawa xizmetkar. Kêçar kur hebû yek dayê. Kê sê kur hebû yek dayê, kê du kur hebû, yek dayê. Du kurê min hebû, yek dayê, yek ma. Dor derbaz bûye hatîye ser min. Wî jî dixwezin. Xanê, alîkarîyê bide min."

Çavên Basataye reşevet bi hêsirava tijî bûn. Bona birê xwe qalkirîbû, xanê, çi qal kiribû.

Cîyê tarî odên xwe avakiribû

Yeqîn wî zalimî hilweşandibû, bira!

Hespên revok ji tewlê

Wî zalimî bijartibû, yeqîn, bira!

Ji qenterên devên tek hur kuçîyê;

Wî zalimî cuda kiribû yeqîn, bira!  
Li şulenan pezê qirkirî  
Wî zalimî qirkiribû yeqîn, bira!  
Bûka bişa te anî bû,  
Wî zalimî ew ji te durxistîbû yeqîn, bira!  
Bavê minî rîdan sipî da girîdanê,  
Ew "lawo" got girîya yeqîn, bira!  
Dayîka mine rûsipî dakizirandine yeqîn, bira!  
Lûtka cîyayê pêşberî minî bilind bira!  
Ava çemê minî gurîkişîyayî bira!  
Hêza pişta mine qewat,  
Ronahîya çaven mine reşvehatî, bira!

"Ji birê xwe qetîyan" got, gellekî girîmam, kire kîne-kîn. Basat xerbendek da wê jinikê, got: "Here kurê xwe xilaske."

Jinike xerbend hilda anî, dewsa kurê xwe da. Him jî mizginî da Arûz, got: "Kurê te hat." Beyên Oxûzêye mayîn Basat pîşwazkirin. Basat destê bavê xwe maçkir. Girîyan, kirine îske-îsk. Hate mala dîya xwe. Dê kur pîşwaz kir, hemêz kir. Basat destê dîya xwe paçkir. Hev dîtin-girîyan. Begên Oxûza beşter

bûn. Meclîsa xwerin-vexwerinê destpê bû. Basat got: “Begno, bona xwîna birêxwe hildim dixwezim derême pêşîya Çavenî. Hûn çî dibêjin? Gazan xan li-vira qalkiribû, kabinê, xanê, çawa qal kiribû:

Çavenî mezinê gewre bû

Li ezmîn serhevda wegerand, nikarbû  
erdêxim, Basat!

Çavenî bû pilingê mezin,

Li çîyayên bilind bakir, nikarbû erdêxim, Basat!

Çavenî bûşêrekî har

Li nava qamirê sixte nikarbû erdêxim, Basat!

Wekî bibî mêrxas qence

Lê tuyê ji min Gazan zêde nebî, Basat!

Bavê xweyî rîdansipî nede girîdanê!

Dîya xweye porsipî mede zare-zar kirinê!

Basat got: “Ezê esse herim!”

Gazan got: “Tu zanî.”

Bavê wî girîya got: “Lawo, ocaxê min bê xweyî nehêle, rehmê bike, neçe!”

Basat got: “Na, bavê minî ezîzî rîdansipî, diçim”  
Ewî guh neda bavê xwe, ji milê kincê xwe qevze tîr

derxist, derbazî bendpiştê xwe kir. Şûr jî gîrêda, yay kire milên xwe. Pêşe da beravkirinê. Destê dê-bavê xwe maçkir, "helalî xwest", got "silamet bimînin." Ew hate zinarê Salaxanê ku, Çavenî lê dima. Dît ku, çavenî ser piştê ber tavê veleziyaye. Ji pišta xwe tîrek kişand derxist. Tîrek li pilêÇavenî lêda. Ew derbaz nebû, kerî-kerî bû. Careke din avît. Ew jî hûrxweş bû. Çavenî gote kalemêra: "Van mêşên cî em posîde kir!" Basat careke din avît. Ew jî kerî-kerî bû, kerîk hat kete ber Çavenî. Çavenîçirpkire ser xwe, nihêrî. Basat dît, destên hevxişt kire şeş-şeş kenîya. Kalemêraran got: "Ji Oxûzan dîsa mera berxekîgihîştî, yê xwerinê hatiye." Basat kire pêşîya xwe girt. Ji gewrîyêda girt, anî cîyê razana xwe. Ew kire gewrîya saqa sapoka xwe. Got: "Lo kalemêrno, nîvro, evî bona min bistêra derbazkin, bikine kibab, buxwim." Dîsa raza.

Şûrê Basat hebû. Gewrîya sapokê bi şûr qelişand, ji nav derket. Got: "Lo kalemêrno, mirina vî di çidaye?" Gotin: "Em nizanin. Lê xêncîçav goşt li tu derê wî tune." Basat hate ber serêÇavenî. Qapaxêçavan bilind kir. Nihêrî dît ku, çavê wî jî goşte. Got: "Lo kalemêrno, şûr bikine nava êgir, bira sorbe!" Şûr kirine nava êgir, sor dibû. Basat da destê xwe. Nava bedew Mehemmedra salavat kişand. Usa

şûr tepisande çavêÇavenîçavê wî rijîya. Çavenî usa kire qirini, usa kire helan, çîya banîya dengvedan. Basat banzda, kete şikevtê nava pêz. Çavenî zanibû Basat şikevtêdaye. Ber derîyêşikevtê sekinî, pîkî xwe danî alîkî derîyêşikevtê, pîkî xwe danî alîyê derîyêşikevtêyî mayîn. Got: “Hey mezinên pêze nêr, yeko-yeko werên derbazbin!” Yeko-yeko hatin derbaz bûn. Serê her yekî mizda. “Kavirno, hebûn-dewleta min beranê gaşka, werên derbazbin!” Beranek ji cîyê xwe rabû, yên mayîn da ber sturîya pêşta êriş kir. Basat di nava çirikekêda beranek tepisand serjêkir, post derxist, postê boçikêû serî dernexist, kete nava post. Basat hate pêşberîÇavenî.

Çavenî têderxist Basat nava çermdaye. Got: “Wey beranê gaşka, te çi zanibû ezê ji çi bême birandinê? Ez usa te dîwarêşikevtêxim, boçika te şikevtê rûnke!” Basat serê berîn dirêjîÇavenî kir, Çavenî sturîyê berîn qayîm girt. Bilind kirinê sturîûçerm destda ma. Basat ji nava pîyên Çavenî bijiqî derket. Çavenî hilda sturû erdê xist. Got: “Kuro, hişk bûyî?” Basat got: “Rebê min ez xilas kirin”. Çavenî got: “Lolo kuro, hanê vê gustîla pêçîya min têke pêçîya xwe, bila tîr ûşûr li te karnekin. Basat gustîl hilda derbazî tîlîya xwe kir. Çavenî got: “Kuro, te gustîl hilda kire tîlîya xwe?”

Basat got: "Min kirê." Çavenîêrîşî ser Basat kir, bi şûr lêda, jêkir. Basat banzda dûr sekinî, dît wekî gustîl dîsa ketiye bin pîyêÇavenî, cîda maye.

Çavenî got: "Xilazbûyî?" Basat got: "Rebê min ez xilazkirim", Çavenî got: "Kuro, wê kunbezê dibînî?" Dibê: "Dibînim." Çavenî got: "Xezina min heye. Here morke bila ew kalemêr hilnedin." Basat ket hundurê kumbezê. Dît ku, zêr-zîv beravkirine. Mêze kirinê her tişt bîr kir. Çavenî derê kumbez girt. Got: "Ketî kumbezê?" Basat got: "Ketimê". Çavenî got: "Naha eze usa lêdim ku, tevî kumbezê hûrxweş bibî. "Basat "laîlahe îllallah, ji Mehemmed resûlallahra"-got. Hema wê demê kumbez qelişî, hevt cîya derî vebû. Basat derîkira derket.

Çavenî destê xwe xişî kumbezê kir. Usa lêda, wekî kumbez sero-bino bû. Çavenî got: "Kuro, fitiliyî?" Basat got: "Rebê min ez fitilandim". Çavenî got: "Mîrina te tunebûye! Wêşikevt tu dibînî?" Basat got: "Dibînim!" Got: "Liwir du şûr henin: yek bi kindar, kalane yek bê kindare kalane. Serê min ew şûrê bê kindarê jêke. Here, hilde, serê min jêke!"

Basat çû ber derêşikevtê. Nihêrîşûrekî bê kalan nasekine, bilind dibe, ber jêr dibe. Basat kete mita-

lan. "Gotî ji xwe çavrakim." Şûrê xwe derxist, ber wî girt. Şûrê wî bû du kerîyan. Çû darek anî, da ber şûrê wî. Ew kire du beşan. Paşê yaya xwe da destê xwe. Bi tîrê zencira şûr pêda dardakirî xist. Şûr erdê ket. Ewîşûrê xwe kire kalîn. Ji destîyê wîşûrîva qayîm girt! Hat got: "Ay Çavenî, çawanî?", Çavenî got: "Lo kuro, dîsa nemirîyî?" Basat got: "Rebê min ez fitilandin". Çavenî got: "Tera min tunebûye!"

Çavenî gazîkiribû qalkiribû, ka binêçi qalkiribû:

Çavem, çavem, tenêçavem!

Tenê biçav min warê Oxûza kire xerbend! Te ez ji çavên beden kirim, mêrxaso! Xwedê te ji canê teyîşirin cudake!

Awa ez derdêçawa dikişînîm!

Çavenî dîsa got:

Tu mêrxas ji ku hatî, cîyê te çi cîye?

Şeva tarî rêşaşkî, hêvîya bi çîye? Roşa şerê giran xanê we kîye ala mezin hilde, roja şêr li pêşîye?

Navê bavê teyî rîdan sipî kîye? Mêrxaso, wekî ji mêrxas navê xwe veşêrî, şerme.

Navê teçîye, mêrxaso, bêje min!



Basat Çavenîra qalkir, kabinê, xanê, çi qalkirîbû:  
Cîyelê bûyî, warê min Gunortace!

Şevan tarîrê bixalifim, hêvîya min Xwedeye. Xanê  
meyî ala Mezin hildayî Bayindir xane, Roja şêr mêrx-  
asê meyî pêşîyêçûyî Navê dîya min bi pirsî,-dara  
Gabaye, Salûr Gazane. Navê bavê min bi pirsî-xagan  
Aslane. Navê min bipirsî,-kurê Arûz Basate.

Çavenî got: “Em birêşîrîn, qemişî min meke!”

Basat got:

Lo ebleh, bavê minî ridan sipî te daye girîdanê,

Dîya mine porsipî, pîr te daye zêrandinê.

Birê minî helal Gîyan Selçîkî te kuşt,

Bûka min bi xêli te bî hîştîye,

Zarê minçavbelek te şewî hîştîye.

Hetanîşûrê xweyî mezinî pola nekişînim,

Serê teyî bi papax jênekim,

Xwîna teye sor hilneşîme rûyê erdê,

Heyfa birê xwe Giyan hilnedim

Eze nehêlim tu zindî bimînê, nehêlim!

Çavenî jî livira qalkiribû, gotibû:

Min digot, ji cîyê xwe rabim bisekim,

Beyên Oxûzêye qewreran sonda xwe biterbînîm,  
ser mila şahîna bakujîm. Carekê ji goştê mirovan têr-  
bim. Begên Oxûzaye qewre bên ser min, min digot  
ku, ezê birevim têkme zinarê bi mancanaka kevirê  
giran bavêjim ji kevirê jorda ku, bibarî serê min bimi-  
rin. Te ez çavbelekê kirim, mêrxaso Xwede te ji canê  
teyî şîrîn bike!

Çavenî careke din qalkiribû, gotibû:

Min rîdansipîyê kalemêr gellekî daye

Diqewime nîfirê rîdansîpî ez girtim, çavê, girî-  
danê,

Pirên porsipî gellekî daye girîdanê,

Diqewime hesirên çavên dayîka girtim,

Çavê min, tu?

Cîwanê simel xwîdayî gellek xwer.

Diqewime cîwantîye ez girtim, çavê min, tu?

Keçên dest hene gellek xwer,

Nîfira wana ez girtim, çavê tu?

Ez dikişînim şewata çavan,

Bila xwedê barê çav nede tu kesî, jana çav!

Çavê, çavê, way çavê! Tenê çavê!

Basat hêrsket, ji cîyê xwerabû hat Çavenî mîna dev ner çok kuta erdê hate ser hev. Bi şûrê Çavenî stuyê wî lêda. Serê wî kire nava kewanê, erdêra kaşkir anî ber derêşikevtê.

Basat kalemêr Bûnlûû kalemêrê Yapagli bona mizginîyêşande êla Oxûzan. Wana hespê sipî – boz sîyarbûn dane rikefa. Bersîv gihîşte êlên Galin-Oxûzan. Devhesp Arûz bi rikêv hate mala kalemêr. Ewî xebera şaya Basat da wî: “Mizginî! Kurê teÇavenî kuşt!”.

Begên Galin Oxûzê hatin gihîştin. Hatine zinara Salaxanê. SerêÇavenî hanîne nav.

Bavê Gorgûd hat miqamêşayê lêda. Çi hatibû serên mêrxasên merd gotin-bilandin. Usa jî duwa xêrê ragîhande Basat:

Tu gihîştîné Gara Daxê, buhurê bide!

Ji avên gur, berê xwe derketî derbazbî, buhurê bide!

Te bi mêrxasî xwîna birê xwe hilda!

Begên Galin Oxûzê ji bobelatê da xilazkirinê!  
Qadir-qudrete xwedê rûyê te sipîke, Basat! - got.

Xêr-duwayê bidine te jî, xanê:

Mirin hatinê we ji îmana qenc neqetîne! Bila sûcê  
we biborîne Mehemed Mustafayê nav ezîz, xanê,  
hey!

*Wergervan: Fexreddîn Paşayêv*



## **Agahdarîya derheqa dastana “Kîtabî-Dede Gorgûd”**

Azerbaycan ser Rêya Hevrûsmêye Mezin ya ku, Asîya û Avropayê digihîne hev, ber bera Xezerêda cî-war bûye. Li Azerbaycana ku, bi bîrdarên yên ku, ji alîyê YÛNÊSKO-yê têne parastinê çawa hebûna çandêye dunya dewlemende, bi dehan gel, hindikjimarên êtnîk û olî di rewşa dostî, hêznîyêda dijîn.

Êpos, dastan, çîrok, vekokên folklorêye mayîn yên ku, ji dewrên hên bi zimanê Azerbaycanî-tirk ya ku, mecala berbûnêye gelên cuda-cudaye ku, vê navberîyêda dijîn hatine efirandinê bê jimarîn. Wana hêjaya menevî-ebûrî ya dewrên xwe parastine, xweyî kirine.

Ji bîrdarên awaye çandêye ne daringî yek jîêposa “Kîtabî-Dede Gorgûd”e. Ev êpos cara ewlîn ji alîyê rohilatzanê alman Haynrîx Frîdrîx Fon Dîts sala 1815 ulmê dunyayêra daye naskirinê. Fon Dîts beşeke dastanê wergerandîye zimanê almanîû bi pêşgotina xwe li Bêrlînê dide weşandin.

Sala 2000-da salvegera 1300 salîya êposa “Kîtabî-Dede Gorgûd” di bilindaya YÛNÊSKO-yê li Azerbaycanê hate derbaz kirinê. Vê yekêra girêdayî Lîdêrê Netewî yê hemû gelê Azerbaycanê Hêyder Elîyêv awa gotibû: “Kîtabî-Dede Gorgûd” ya ku, neynûka dîrok, bîra êtnîk, zanebûna arxaîk ya gelê Azerbaycanêye, çawa kilama vegotina me, zimanê me, menevîyyata me, ruhê me weteke mezine çandî-êstêtîke”.

Êposa “Kîtabî-Dede Gorgûd” ji 12 bûyeran û ji pêşgotinekêye. Bûyeranda derbarê şerkarîya mêrxasên Oxûzan tê qal kirinê. Dede Gorgûdê ku, êposê qal dike ozanekî zaneyî temene dirêje, yê ku, dîroka gelê Azerbaycanêyî buhurî zane, Homêrê azerbaycanîyane. Her beşeke êposê dunêdîtîna mîfologîye gelê Azerbaycanê, dîrok, kevneşopî, şerkarî, rabûn-rûniştandin, ziman, ol, çanda wî bi rengên wêjeye dewlemend dinitrîne û qal dike.

Derheqa êposa “Kîtabî-Dede Gorgûd” 200 salên dawîyêda ulmdarên alman, îtalyan, rûs, tirk, holland, îngîlîs, macar, fransîz, tirkologên dunyayêyî herî navdar lêkolîna ulmî kirine, mêrxas û beşên êposê cuda-cuda himberî nîgarên mîfologîyayê hên yên yûnan û romayê kirine, çawa Fon Dîts carna dane kivşê ku, “Kîtabî-Dede Gorgûd” ji wana bîrdarekî daha hêne. Ji alîyê filolojî dengdayîna vê bîrdarê tevî êposên gelên hêne cuda-cuda naha him jî wî wergerandîye obyêkta lêkolînê yên pêşekzanên çiqilên ulmêye din, çawa gêrmanîstan, slavîstan.

Êposa “Kîtabî-Dede Gorgûd” ya ku, gelê Azerbaycanê xuluqandîye bi hûmanîzm, kolorîta xweva, bi bangawazîya dunyayêda jîyîna di nava aşti û seqirtîyêda ne ku, tenê hebûna Azerbaycanîyan, dunya tirkaye, lê hebûna hemû civakîya dunyayêye.

*Serraf Balaxan*







## **Agahdariya derheqa Hênrix Frîdrîx Fon Dîts (1751-1817)**

Dîplomat û rohilatzanê Almane naveyan Hênrix Frîdrîx Fon Dîts sala 1751 li bajarê Bêrnburgê ya Almanîyayê (Prûssîya) malbeta bezîrganêda hatiye dunê. Bona xwendina mafê dest bîne sala 1769 tê pejirandinê Ûnîvêrsîtêta Hallê, xwendina akadêmîk xitimkirinê şûnda 11 sal li Magdêburgê di serencama hukumeta navberîyêda kar dike û li vira beqî qendera xweye taybetî ji rêfêrêntîyê hetanî serkarê defterxana mezin dibe.

Roja 16 gulanê sala 1784 ku, ew ji alîyê Kral Frîdrîxê Mezin tê kivşkirinê baylozvana Tirkîyayê çawa şewirdar bona çarenûsa dahatîya tirkologîya û gorgûdzanîyê rojeke taybetîye. Fon Dîtsê ku, xwendina wîye rohilatzanîyê tunebû wedê Îstanbûlêda baylozvanêda kar dikir zimanê tirk û zimanên rohilatê hîndibe. Ew, sala 1786 ji alîyê Kral Frîdrîx Vîlhêlm II rewayî tîtûla gire-girê dibe û tê kivşkirinê çawa wezîr û baylozê kefildarêye mezin Prûssîyayê yê li Tirkîyayê. Beqî hezkirina ber bi tirkan ûpêkarîya xweye taybetî di nava 6 salan

ku, li Îstanbûlê dijî gellek destnîvîsarên rohilatêye terwende berav dike. Bi gotina Dîts û bi agahdarîyên ênsîklopêdîk li pirtûkxana wîda 17 hezar pirtûk, 856 destnîvîsar hebûye ku, ji wana 407 derbarê Rohilatêdaye. Ewî vesîyet kirîye ku, dunya xwe guhastinê şûnda hemû pirtûkxana wî bidine Pirtûkxana Kralê ya Bêrlînê.

Dîts sala 1790 peyvîra baylozîyê xitim dike, vedigere welatê xwe, dest bi lêkolîna destnîvîsarên hêja ya ku, bi zîmanê erebî û farsî berav kirîye dike. Ewî, pirtûka xweye bi navê “Gabûsname” sala 1811, salên 1811-1815 “Berovekên destnîvîsarên bîrdarên Asîyayê” dide weşandinê. Pirtûkêda bi wergera Fon Dîts rîsaleya Şêyx Mehemmed Lalezarî ya bi navê “Mîzanî-Ezhar”, seyahetnameya Katîbî Rûmî ya bi navê “Mîrat-ul-Memalîk”, Oxûznamaya Gîlîyên Bavan ya bi navê “Oxûz Kîtabî” û ji “Kîtabî-Dede Gorgûd” buyera “Basat Çavenî dikuje” cî-war bûye. Bi vêçalekîya xweva Dîts rûmeta taybetî yê helbestvan û kesayetê hêle Hotê qezenc dike. Yohan Wolfgang Fon Hotê di pirtûka xweye bi navê “Dîvana Rohilat-Rojavayê”, beşa “Tênvîsarên û Nêtan”êda rohilatzanê naveyan Dîtsra şêkirdarîû rûmeta xwe dide zanînê, bona wê yekê ku, weyneke Dîts di efrandarîya wîda pîrr bûye. Paşê sala 1816 Dîts “Serpêhatîyên Molla Nesreddînê” werdigerîne dişîne Hotê.

Wedê xweda ewî tevî hemdewrên xweyî ulumdarên naveyan yên Prûssîyayê mîna Frîdrîx Avgûst Volf, Alêksan-

dr Fon Hûmbolt, brayên Şlêgêl û Grîmm bona ulmê alman para xwe daye û bûye ji kesayetên yek yên ku, bingeha komparatîvîstîkaya wêjeyîye alman danîne.

Ji sala 1814 dest bi dewrê efrandarîya H.Dîts ya “Kîtabî-Dede Gorgûd” dibe. Bi destê xwe rûyê oxûznameya “Kîtabî-Dede Gorgûd” ya ku, di Pirtûkxana Krale Drêzdênê nêrîna tu kesî nekişandibû ser xwe derdixe, himberî ya xwe dike, ji nava wan bûyera “Basat Çavenî dikuje” û wîra pêşgotinek dinîvîse, dide weşandinê. Bi wê yekêva ulumdar ev êposê bona ulmê dunyayê dide naskirinê, nîgarê Çavenî himberî sîklopê Homêrê dike û nêta Çavenî ji Polîfêm hêne diparêze.

Sala 1814 Fon Dîts beqî para ku, daye ulmê rohilatzanîyê tê bijartinê endamê firnax yê Akadêmîya Ulman ya Prûssî-ayê.

*Revan Hesenov*





## Weteya navên

1. *Prêlat* – li dêra katolîkan peyvîrekî ruhanîye bilind
2. *Sîklop* – lehengê ku enîyada çavekî heye
3. *Foliant* – pirtûka ku, forma Folîodaye, pîvandina rûpêlê beranberî nîvrûpêlêye
4. *Paûl* – gelê Mansi
5. *Gaya* – Oxûzanda navê eşîrêye
6. *Ştrîttêr* – dîrokzan û rohilatzanê alman. Yohan Gothêlf von Ştrîttêr (1740-1801)
7. *Dêgûîqnês* – Josêf dê Gûîgnês (1721-1800). Dîrokzan û rohilatzanê fransî
8. *Îkonûm* – parwelata Konya ya Tirkîyayê naha
9. *Oksûs* – parwelata Amû-Deryaya naha
10. *Polîfêm* – Çavenî
11. *Arqês* – ji sîklopên mîfolojîye hên yê yûnanan
12. *Brontês* – ji sîklopên mîfolojîye hên yê yûnanan

13. **Coêlûs** – mîfologîya yûnananda Xwedayê Ezmûnê Ûran
14. **Lûpara** – Yûnanistanêda girav
15. **Apollo** – mîfologîya û ola Roma û Yûnanistana hênda xwedaya Xwedayê Şems, ronahî eqlê û piştovanê huner-mendîyê. Kurê Zêvs û Lêtan
16. **Makrobîûs** – Ambrosîûs Theodosîûs Makrobîûs (395-430) zimanzan û filosofê Romaya hên
17. **Sîsêron** – Mark Tûllî, filosof û nefsdarê sîyasî yê Romayê (ji z.b. 106 – ji z.b.43)
18. **Arqos** – bajar liPêlêponnêsê, Yûnanistana hên
19. **Lîkîya** – li Asîya Biçûk dewlet
20. **Strabon** – dîrokan, gêografîyazanê yûnanî (ji z.b. 64/63 – ji z.b. 23/24)
21. **Naûpla** – li Yûnanistanê bajar
22. **Homêr** – helbestvanê yûnanêye hên, torîvanê poêmayên “Îllada” û “Odîssêy”a (ji z.b.XII-XI)
23. **Trînakrîa** – Sîcîliyaya naha
24. **Phonîkîran** – Fînîkîyan
25. **Lîlîbêîş** – navê qendavê
26. **Êtna** – navê çîya
27. **Faraqlîonî** – gravê ku sîklop lê dijîn

28. **Katanîya** – li Îtalîyayê parwelat
29. **Val di Dêmonê** – newala Îblîsan, li Bakûrê Katanîyayêdaye
30. **Nêptûn** – li mîfologîya yunanan Xwedayê ber
31. **Nîmfê Toza** – nîmfaya ber Toza
32. **Amfîdrîtê** – ji na Posêydon
33. **Nîmfê Ştîlbê** – wagoî dîya Polîfêm
34. **Amînonê** – wagoî dîya Polîfêm
35. **Êlatûs** – wagoî dîya Polîfêm
36. **Arqonawtan** – argo navê keşîyaye, yên ku, bi vê keşîyêva bi serkarîya Yaso dû hirîya zêr çûne Kolxîda
37. **Plato** – (Platon) filosofê îdêalist yê Yûnanistana hên (ji z. b. 428/7 – 348/7)
38. **Aklîan** – (Klaûdîûs Aklîanûs) (170-222) filosofê Romayê, dersdarê rîtorîka
39. **Thêofîlos fon Êdêssa** – (695-785) ulumdarê Sûrîyayê ji Êdêssayê (Ûrfaya îro – Tirkîya)
40. **Fabrîtsîûs Hîronumûs** – ulumdarê îtalîyan (1537-1619)
41. **Dîo Krîsostomûs** – (344-407) arxîyêpîskopê Konstantî-nopolê. Johannes Crysostomos ya jî Johannes fon Antioxia
42. **Prîam** – bavê Hêktor û Parîsê, hukumdarê Troyayê







**Wergervanên pêşgotina Hênrix Frîdrîx Fon Dîts ya bi nave “Sîklopa Oxûzê ya ku nûva eşkerekirî himberî ya Homêrê” û bûyera “Beşa ku Basat Çavenî dikuje dide kivşê”**

1. **Zimanê azerbaycanî** – Têlman Kazimov (dosêntê Ûnîvêrsîtêta Slavyanêye Bakû), Revan Hesenov (şêwirdarê sereke yê Navenda Mûltîkûltîralîzmê Navnetewîye Bakû)
2. **Zimanê almanî** – Hênrix Frîdrîx Fon Dîts (dîplomat û rohilatzanê almane bi nav-deng)
3. **Zimanê avar** – Cemîle Kêysêrovskaya (karkara ulmê ya Înstîtûta Zimanzanîyê ser nave Nesîmî ya Akadêmîya Ulmên Netewîye Azerbaycan)
4. **Zimanê çîn** – Lêy Çên (kedkarê rojname “Cîwanên Çîn” ya ku li Rêspûblîka Gelêye Çînê tê weşandinê)
5. **Zimanê ermenî** – Gafar Çaxmagli (dosêntê Ûnîvêrsîtêta Ercîyes ya Tirkîyayê, rojnamevan)

6. **Zimanê erebî** – Ehmed Samî (dosêntê Ûnîvêrsîtêta Êyn Şems ya Mîsîrê, dîrêktorê Navenda Têklîyên Xwendin û Çandê Mîsîrê ya li Azerbaycanê)
7. **Zimanê farsî** – Mohsun Naxisoylû (endamê Akadêmîya Ulmên Netewîye Azerbaycanê, profêssor), Şehla Abdûl-layêva (karkara ulmî ya Înstîtûta Destnîvîsaran ser nave Fuzûlî ya Akadêmîya Ulmên Netewîye Azerbaycan)
8. **Zimanê fransizî** – Mîşêl Bozdemîr (profêssorê Ûnîvêrsîtêta ÎNALKO ya Fransayê), Guluş Axamammedova (nivîskar)
9. **Zimanê gurcî** – Îmîr Memmedlî (helbestvan, nivîskar û wergervan)
10. **Zimanê hîndî** – Sûdha Svarnakar (profêssora Ûnîvêrsîtêta Dewletêye Paraîba ya Brazîliyayê)
11. **Zimanê xinalig** – Zakîr Axayêv (nûnerê îcmaya Xinalig ya Azerbaycanê, wergervan)
12. **Zimanê îngîlîsî** – Anna Tomson (nivîskar û wergervan)
13. **Zimanê îtalyanî** – Danîêl Franzonî (kedkarê Ûnîvêrsîtêta Gênuya ya Îtalîyayê, wergervan)
14. **Zimanê kurdî** – Fexreddîn Paşayêv (sedrê Navendê Çanda Kurd “Ronahî” ya Azerbaycanê, wergervan)

15. **Zimanê lezgi** – Sedaget Kazimova (serek rêdaktorê rojnameya “Samûr”ê ya ku, Azerbaycanêda tê weşandinê, nivîskar, pûblîsîst)
16. **Zimanê macar** – Êrdêlyî Mêlînda (dosênta ûnîvêrsîtêta Eutvus Lorand ya Macaristanê, tirkzan)
17. **Zimanê rûsî** – Sêyfel Hesenov (dosêntê Ûnîvêrsîtêta Slavyanêye Bakû)
18. **Zimanê tirkî** – Fikret Turkmen (profêssorê Ûnîvêrsîtêta Êgê yê Tirkîyayê)
19. **Zimanê talîş** – Mêhman Garaxanoxlû (helbestvan, rexnevan û wergervan)
20. **Zimanê tat** – Rexşende Bayramova (nûnera îcmaya Tat ya Azerbaycanê, dîrokzan)
21. **Zimanê ûdîn** – Rafig Danagarî (nûnerê “Îcmaya Xrîstîane Alban-Ûdîn” ya Azerbaycanê, wergervan)
22. **Zimanê ûkraynî** – Mêhman Salmanov (kedkarê Şîrketa Têlêvîzîya Netewî ya Ûkraynayê, wergervan), Olêna Sêmênçûk (rêdaktora wêjeyî ya Şîrketa Têlêvîzîya Netewî ya Ûkraynayê)
23. **Zimanê yapon** – Takayûkî Yokota Mûrakamî (profêssorê Ûnîvêrsîtêta Osaka yê Yaponîyayê)

24. **Zimanê yûnanî** – Seîde Mêhdîyêva (karkara ulmî ya  
Ûnîvêrsîtêta Slavyanêye Bakû, sedra Civakîya Argo Yûnan  
Azerbaycan)
25. **Zimanê yehûdî** – Terane Husêynbalayêva (dosênta  
Ûnîvêrsîtêta Dewletêye Bakû), Hadas Mêlêx (dersdarê  
mekteba hejmara 3 li Îsrailê, wergeroan)

## Munderîcat

Serencama Prêzîdêntê Rêspûblîka Azerbaycanê  
Îlham Elîyêv.....4

Bi hub-hizkirina Fon Dîts (Pêşgotin).....7

### Hênrix Frîdrîx Fon Dîts

Siklopa Oxûzê ya ku nûva eşkerekirî  
himberî ya Homêrê.....11

“Beşa ku Basat Çavenî dikuje dide kivşê” .....43

Agahdarîya derheqa dastana “Kîtabî-Dede Gorgûd” .....61

Agahdarîya derheqa Hênrix Frîdrîx Fon Dîts.....65

Weteya navên.....69

Wergervan.....73





*Nəşriyyat redaktoru - Əliş Ağamirzəyev  
Texniki redaktor - Mətanət Qaraxanova*

*«Mütərcim» Nəşriyyat-Poliqrafiya Mərkəzi*

Çapa imzalanıb: 05.11.2015. Format: 70x100 1/32.  
Qarnitur: Palatino. Həcmi: 5 ç.v. Tiraj: 1000.

*«Mütərcim» TM, Az1014, Bakı, Rəsul Rza, 125  
Tel.: (+994) 596 21 44, e-mail: mutarjim@mail.ru  
[www.mutercim.az](http://www.mutercim.az)*